SÛRETÊN HISRETÊ Û KESERVEDAN

Arif Arî / Amed

Bihar
Her dar hildiperike rojê
her şax bi her guliyî re her pel
Bihar; kîşwereke bîhn nefel
Bihar; sîngûberên dukel
Û qetîtkên erxweanî
Û geşta li zeviyên gerdenê..

Di bin serê te de balgih e zen-
deke min
Yê din li te pêçayî, koremar
Li keviyên Dîjle stirana (hele yar)
Xweş hest im Bihar, sermestim
Bihar!
Tu Bihar, dor bihar, ez bi har

Çî din bixwazim jio Xwedayê bi tenê!
... Û tu neyê?
Rûbarekî bibîne, ku ji kaniyekê derneyê
rojekê bibîne rojekê, ku bi siha-rê re hilneyê
Her roj dimirim di mextela ben-demayînê de
Hêviya hatinekê dipûrisînim,
hêvî biqede.. û tu neyê?
Şeş rêz gazin
Ji newaya qumriyan deng biliya
Di şkefta devê min de stiraneke şev çû
Jî te ji welatekî bêxwedî
Ji hezkirinê pê ve min çi kiribû!
Kitikeke min jî nîne
Qumrîka dawî jî firî.. û çû!
Li dû
Her ku pirpirînkek firîya şaxek hejiya li dû!
Li dû; di çengên siharê de meyan xilolîk
Li dû; ne şev ne roj ne kêlîk..
Li dû; dil bi piyan neket dil ji şîr venebû!

Bendî
Mişt keser î tu hilm bi hilm bêrî
Di nava tiliyên min de rojek din zerirî
Hûtekî hefî serî ye di çîrokan de çile
Min dixwe, dil dikevêje, zaman dirûxe
Di kêlîkeke jibîrbûyî de te dest biavêta berî..!
Bêbavê
çavên te: binefşên tenik
Di sipêde de şîrkî şîrkî, hênik
Bayek in; nermik nermik, nişmî..
Bêbavê, di çavên te de vemirîn
Çil biharên hevrîşmî!
Têm
Di xurcika min de hemû qewîtî
Kembera zîvî, hina qeş
mîrê, heprî..
Cotê xirxalan ji bîr dikim qet!
Siwarê hespa kimêt im têm
Têm ku bikim xizêm Berîka Binxetê!
Kîjan mîreke li devê riya te?
Se diwete, gur dizûre baz difîkîne

Tu bilîlîne b wî dengê saba
Şîyar ke ji xewê çiyakên
Şerxetê
Ev qûça hana Şemeriyan
Neyar in jixwe ez û vê
hikûmetê!
Kulîlk hene
Kulxîlk hene; sihar sihar divebin
êvar diçilmisin
Kulîlk hene qurmiz qurmiz, ji
qefesê dil didizin
Kulîlk hene; bejin aza çiya çiya
dilerzin
Kulîlk hene kulîlka min, di gul-
danka dil de narizin
Pirs

Mirin bêî te bûne
Mirin ji te dûrbûn, li cem te
nebûne
Dimirim dimirim bêrî te
Ku ez bimirim, tu ê çi bikî bi
tenê?
Tembî
Yan li kendalên dil bikole
Yan jî li perên xwele çiyayekî
Şerme şairikî çiyayî dahêjin
gornê
Li goristaneke kêl kerr
Li ber guhên zirr bajarekî!
Kê negor, ax! û n nû?
Kî nebû ax.. û neçû?
Felek, qajikê biçû
Arjen jî dil bi dax neçû?